

Pirtûka Belûqiya

MUSTAFA DEHQAN

WERGERA JI ÎNGILÎZÎ: MEHMET ŞİRİN FILİZ

Navê wî minafiqî Bekir bû


Belkî ji Belûqiya betir bû

Nivîskarên Misilman ên qirna navendî pir meraqdarê pêxemberên din bûn û ji bo ku wan hem fêr bikin hem jî pênase bikin gelek xebat kirin. Qadeke taybet ya edebiyata Îslamê jî qiseyên enbiyayan (çîrokên pêxemberan) bû. Ev qiseyan, li gel Pêxemberê Îslamê bi pêxemberên din re jî eleqedar bûn. Ev xebata kurt di çarçoveya çanda Kurdî de li ser helbesteke ku vegotinek di navbera Belûqiya û Sultan Silêman de ye hûr dibe. Analîzên metnî yên ku di vê xebata kurt de hatine kirin nîşan didin ku bi awayekî krîtîk girîng e ku mirov qiseyên enbiyayan di çarçoveya pirçandîtiyê de binirxîne. Li vir ezê behsa lîteraturek dirêj ya edebiyata qiseyan nekim, tenê ezê destxetêke Kurdî ku nû hatiye dîtîn pêşkeş bikim.

Destpêk


Belûqiya ew çîrok e ku di nav çanda Îslamî de baş tê zanîn. Ev çîrok hem di nav çanda qiseyên enbiyayan de hene û hem jî di nav çîrokên hezar û yek şevî de jî navdar in². Di bingeha çîrokê de kurê qralekî Îsraîlî heye. Ew hin tiştan dibîne û ew tişt wî derdixe ger û geşteke da ku Mihemed Pêxember bibîne. Di rê de rastî gelek macerayan tê. Ew rastî qral Silêmanê ku mirîbû tê, lê dema bala xwe didê dibîne ku laşê wî bi awayekî tekûz hatiye parastin. Çîrokên araste yên bi vî rengî hem di qiseyên enbiyayan de û hem jî di nav çîrokên *Hezar û Yek Şevî* de gelek hene.³

Dîtina bingeha çîrokê gelek zehmet e. Wer dixuyê, ew bêtir bi çîrokên Cihûyan peywendîdar e, lêbelê heger ev refereyî Balaq nebe ku kurê Zippor e û ew jî kurê Qral Muab bû, Belûqiya di nav edebiyata Cihûyan de tune. Hem jî lêkolîna li ser vê bêjeyê nîşan dide ku Balaq di nav Joshua



The First Folio: Fol.199v.

24:9, Judges 11:25 and Micah 6:5, de jî tê dîtin ku ev hemû referekirin piştgiriya vê çandê dikin. Balaq navê beşek Tewratê ye ku di her hefta çilemîn de li Sînagogan tê xwendin. Pênc beşên ewil bi kurtahî wekî TANAK (Genesis, Exodus, Leviticus, Numbers, and Deuteronomy) jî tene zanîn bingehên metnên pîroz yên Cihûyan bûn û bi salan e di civînên hefteyî ku wekî parashot jî dihatin zanîn de, di sînagogan de dihatin xwendin û xebitandin. Heger navê balaq wekî sembolîk tê bikaranîn divê mirov bibêje ku koka b-l-q di Hebrew de tê wateya xerakirin û wêrankirinê. Mîmkûn e ku ew di metnên Încîlê de ji bo pêkanîna îroniyeke mezin bi vî awayî tê bikaranîn. Balaq ji bo wêrankirina Îsrailê sond xwaribû, lê bi ser neket.⁴



The Last Folio: Fol.213r.

Ji bilî paşxaneyê Cihûtiyê tiştek girîngtir heye. Li gor edebiyata qîseyan; Belûqiya pirtûkek dibîne (“pirtûk” di nav versiyona Kurdî de) ku pirtûk der barê Mihemed Pêxember de ye. Ev yek, çîroka Shaphan yê ku pirtûkek di serdema qraletiya Yohiahu de di perestgeha Qudsê de dibîne, tîne bîra mirov.⁵ Ew balkêş e ku her du jî nîşaneyê şoreşeke nû ne. Bêguman beriya Xwedêdana Mihemed Pêxember Cihû hebûn di nav xaka Erebiştanê de, gelek kes li hêviya wî bûn ku ew wekî figûrekî mesîyanîk ji hêla başûr derkevê hole. Îşaretên vê yekê di nav folklorê Cihûyên qirna navendî de hene, di nav edebiyata sîra de ev bi awayekî eşkere hatiye vegotin.

Di nav macerayên din de, li dawiyê Rabba bar Bar Hana heye ku ew li gor Talmudê ew tûşî

macerayên fantastîk hat, di yek ji van çîrokan de Erebeke wî di nav çolê re dibe gerûgeştê, li vir ew rastî gelê Koraç tê, ew zindî ne û heya navê di nav qûmê de ne. Divê li ser macerayên Belûqiya em bêtir hûr bin, lewra ji aliyê naverok û stîlê ve gelek wekhevî di navbera Belûqiya û Rabba bar Bar Hana de hene. Bi rastî jî versiyona Kurdî hem Belûqiya ku wekî di qîsesa enbiya de hatiye dest-nîşankirin û hem jî Rabba bar Bar Hana di nava xwe de dihevwîne. Ez ne bawer im tu kesek li ser van tîkiliyên di navbera du çandan de xebitiye, lêbelê ji bo lêkolînê ev mijareke gelek girîng e.

Destxet (Manuscript)

Bi qasî ku ez dizanim ev pirtûka Belûqiya yekane destxeta Kurdî ye ku gihaştiya dema me. Ev metin nehatiye katalogkirin, di van serdemên dawî de ji hêla endamên Iranian National Library li Tehranê hatiye dîtin û paşê jî hatiye stendin. Ev metin li gor taybetmendiyên ortografîk û arkaîk hatiye senifandin. Digel metneke Farisî ew di nav xwe de mîrateyeke girîng ya metna Kurdî jî dihevwîne. Pirtûka Belûqiya bi jimareya 9251/6, şeşemîn destxeta metna klasîk e. Ew ji rûpela 199 heya 213ê bi zaravaya Goranî hatiye nivîsandin.

Hemû macerayên Belûqiya ku heya niha behs li wan bû di metna Goranî de hene û wer dixuyê bi awayekî pozîtîv aktîf, bibiryar û peyaner in. Dem û cihê teqez yê ku metna Goranî hatiye hilberandin naye zanîn. Versiyona Belûqiya ya ku di destê me de ye ji sedsala 18mîn an jî 19mîn gihaştiye ber destê me. Zaravaya ku di vê metnê de hatiye bikaranîn belkî dikare alîkariya me bike ku em fêhm bikin ka gelo ew li ku derê hatiye hilberandin. Di encamê de mirov dikare bibêje ku jêderka metnê başûrê rojavayê Kirmanşahê, Rohhilatê Kurdistanê ye.

Versiyona Goranî koleksiyoneke homojen pêşkeş nake, lêbelê ew li gor beşan, carina parçeyek biçûk, carina jî bi zimanekî ayînî hatiye dabêşkirin. Beşên wê yên cuda xwedî van serenav û mijara ne: 1. Dua (perestî) û zikir bo Xweda;

2. Sindoqa biçûk ku Belûqiya nikaribû wê veke; 3. Pirtûkek li ser qasîdeyek der barê Pêxember de di nav sindoqê de; 4. Belûqiya pirtûka li ser qasîdeyek der barê Pêxember de di nav benî Îsrail de pêşkeş dike; 5. Ji bo ku ola Îslamê nas bike Belûqiya ji bo xwe gerûgeşteke dirêj amade dike; 6. Belûqiya rastî marek mezin tê û ji wî der barê girîngî mezintiya Pêxember de pirsan dike; 7. Çîroka Belûqiya û Effan; 8. Çîroka qral Solomon û Effan; 9. Belûqiya dikeve erda periyar qralê periyar ziyaret dike; 10. Gerûgeştê Belûqiya Çiyayê Kafê; 11. Belûqiya bi çûkeke zêrîn Pêxember Xizir ziyaret dike û meweiyên bihuştê dixwe. 

Çavkani

- Ibn Kathîr Dîmesqî, el-Imam al-Hafîz Ebî el-Fida' Isma'îl, *Qisas el-Enbiya*, Ed. M. 'A. al-Fadîlî (Sayda-Beirut: al-Maktabat al-'Asriya, 2005).
- Balta, al-Qadî el-Şeyx Muhemmed Dalî, *Qisas al-Anbiya* (Beirut-Sayda: al-Mektebet el-'Esriya, 2004).
- Bel'amî, Ebû 'Alî Muhemmed b. Muhemmed, *Tarîx-i Bel'amî*, Ed. M. T. Baha (Tehran: Zuwwar, 1974).
- Lybarger, L. D. "The Demise of Adam in the "Qisas al-Anbiya": The Symbolic Politics of Death and Re-Burial in the Islamic "Stories of the Prophets", *Numen* 55/5, 2008, pp.497-535.
- Nîşabûrî, Ebû Ishaq İbrahim b. Mensûr. *Qisas al-Anbiya*, Ed. H. Yexma'î (Tehran: 'İlmî we Ferhengî, 2003).
- Rewendî, Qutb el-Dîn Se'îd b. Habba Allah, *Qisas el-Anbiya*, Ed. Gh. R. 'Irfaniyan el-Yezdî (Meşhed: Astan Quds, 1989).
- Schneider, T. "Azariah Son of Hilkiyah (High Priest?) on a City of David Bulla", *Israel Exploration Journal* 38/3, 1988, pp. 139-141.
- Xanî, E. *Mem û Zîn*, Tûrkçesi: M. E. Bozarslan (İstanbul: Gün Yayınları, 1968).

Jêrenot

- 1 Ev beyt nîşan dide ku haya Ehmedê Xanê jî ji Belûqiya hebû. Bnr. Mem û Zîn, r. 214
- 2 Bnr. See, for example, Ibn Kathîr Dimashqî, *Qisas el-Enbiya*, pp.336-351; Balta, *Qisas el-Enbiya*, pp. 203-214; Bel'amî, *Tarîx-i Bel'amî*, vol.1, pp. 559-595; Rewendî, *Qisas al-Enbiya*, pp. 79-81; and Nîşabûrî, *Qisas al-Enbiya*, pp. 281-310
- 3 Bidin ber hev bo nîmûne mirina Adem: Lybarger, "The Demise of Adam in the "Qisas el-Enbiya": The Symbolic Politics of Death and Re-Burial in the Islamic "Stories of the Prophets", pp.497-535.
- 4 Ji bo agahiyên bêtir li ser Balak, bnr. Encyclopaedia Judaica, Vol. 3, p. 83
- 5 Shaphan kurê Azalîah e, Katibê Josiah, yek ji serokê herî bibandor û malbata Pro- Babylions di çend rojên dawî yên Judah, bnr. Schneider, "Azariah Son of Hilkiyah (High Priest?) on a City of David Bulla", pp. 139-141.